

SERPÊHATİYÊN  
BÊCIHÛWARBÛNÊ:  
DI RABÊJA ROMANA KURDÎ  
DE WEKE “WARÊ DEMKÎ”  
DIYASPORA

---

### 1. Ramanên Destpêkê

Berxwedana entelektûel û nivîskarên kurd yên ji Bakurê Kurdistanê ya bi armanca geşedana ziman û wêjeya kurdî ji bo rabêja romanî ya kurdî sîdmend bûye. Divê neyê jibîrkin ku polîtîkayên welatê bicihbûnê ji hêla binavkirina wêjeya kurdî ve pir bi bandor e; di vê wateyê de, saya serê rewş û polîtîkayên lîberal yên li Swêdê, wêjeya kurdî bi taybetî ji 1980an bi şûn de li Swêdê, nemaze di cureyê romanê (*roman genre*) de zêdetir bi pêş ketiye. Wek mînak Mehmed Uzun (1953-2006) û Mahmut Baksî (1944-2000) yên ku bi salan li Swêdê sirgûn mane dikarin wek romanûsên herî berhemdar ên ji Bakurê Kurdistanê bîn hesabandin.

Armanca min di vê gotarê de ew e ku ez çar romanên kurdî li gorî avakirina ‘mal’ a ku ji aliyê serpêhatiyên dîasporî ve hatiye hilberandin, binirxînim. Di vê peywendê (*context*) de pirseke sereke derdikeve pêşberî me: Di romanê de çi cure wate û nirx li sirgûniyê (*diaspora*) tên barkirin? Bi taybetî di gotarekê de ku wê serkeftinên rabêja vegotinî (*narrative discourse*) ya kurdî vebîne, li ser rastî û xisara domdar a bêdewletbûnê ya ku kurdên dîasporayê neçar hiştiye rawestûn, pîrr girîng e.

Ji xeynî rewşa awarte ya kurdan ya ku têkildarî niştimanê wan ê bêstatû ye, ‘mal’ jixwe têgeheke pir-rehendî (*multi-dimensional*) û pir-tebeqeyî (*multi-layered*) ye. Lê belê di rewşa koçberî û jihevqetînê de, fikra ‘mal’ê wateyeke têkiltir li xwe bar dike ku ew ji hesta demkîbûnê zindî dike ango ‘mal’ a niha wek warê demkî dide fêmkirin. Piştî ku min romanên wek *Siya Dema Borî* ya Fêrgîn Melîk Aykoç, *Pêlên Bêrîkirinê* ya Mustafa Aydoğan û

Ronakbîr û *Dora Bacînê Bi Dar e* yên Medenî Ferho analîz kirin, ez angaş dikim ku hesta bêcihûwarbûnê û pêwendiyên bi welêt re yên sosyo-polîtîk ên navneteweyî bûne xala bingehîn a hemû berhemên navborî, û konsantrebûna li ser welatên dûtir dibe sedem ku ew cihê ku lê ne ji ‘mal’ a xwe cuda bifikirin.

## 2. Çavlêgerandineke Gelemperî li Romanên Sirgûniyê

Wek ku berê ji hat destnîşankirin, ji hêla hejmara weşanxaneyan û avantajên wêjeyî ve, ji ber alîkariya mezin a dewletê di nav welatên din de Swêd bûye welatê mêvandar ê sereke ku bi saya serê vê yekê piraniya romanên diyasporayê li Swêdê hatine hilberandin. Yek ji sê romanûs hene ku li Elmanya yê dijîn; Zeynel Abidîn, Fêrgîn Melîk Aykoç û Diyar Bohtî ku hejmareke zêde roman nivîsîne. Medenî Ferho yê ku xwediyê gelek romanên e li Belçîkayê dijî. Her çiqas bi hejmareke zêde roman li sirgûniyê hatibin weşandin jî, ji wan tenê çend heb roman hene ku serpêhatiyên sirgûniyê tînin ziman, lê pîrraniya wan bi awayekî sereke li ser mijarên bi Kurdistanê ve girêdayî ne an serpêhatiyên takekesî yên berî sirgûniyê ne an jî li ser dîroka kevn a kurdan in.

Li gorî Hall (1992a: 236), bêcihûwarbûn arezûya malê gur dike û “arezûya bêdawî ya vegeerîna li ser ‘kokên windayî’ ji nû ve diafirîne, ji nû ve bi dayîkê re dibe yekpare, vegeerîna li ser destpêkê”. Avtar Birah ji tîne zimên ku ji hêla serpêhatiyên sirgûnî de ku “‘mal’ di aşopa sirgûniyê de dibe cihekî efsûnî yê arezûyê. Bi vî rengî her çiqas ziyareta erdnîgariya herêmî ya ku wekî cihê ‘kokê tê ditin” (1996: 192) pêkan be jî, ew der cihê ne-vegerê ye. Ji ber vê yekê, rewşa veqetîna, di hesta ne-vegerê de ‘mal/welat’ jî dêvla ku bibe erdnîgarî û herêmeke rasteqîn, dibe devereke xeyalî ku dîmenekî ‘eqilî tê de dertê holê. Weke ku di aşopê (*fiction*) de tê texmînkirin ‘mal/welat’ dibe “hewesa ku bi rêjeyên cihêreng, bi mijarên (lehengên xeyalî û xwendevan) ji aliyê rabêjê ve hatiye saz kirin re girêdayî ne, tê bicihkirin û înkarkirin. (George 1996:2).

Bi vî hesabî, ez îdia dikim ku li sirgûniyê ji ‘welêt’ dûtirketin an jî tîkiliyên rasteqîn yên bi ‘welêt’ re hewcedariya bi rabêjên romanî re zêde dike, wekî ku bikare bibe alîgirê bîranînê an jî peyama û nêrînên xwe ragihîne. Di rabêja romanî ya ku li sirgûniyê hatiye hilberandin de bikaranîna ‘bîranîn’ û ‘rabirdû’ yê dibe hêmanên sereke. Di vê meseleyê de, serpêhatiyên sirgûnî û rewşa penaberan bêtir ku bêtir înkarkirin karîgerî li ser vebêjên bîranînê (*narrations of memory*) dike. A girîngtir, sirgûniyên bêdewlet ji hêla beşdariya sîyaseta welêt ve hest dikin ku zêdetir çalak bin û zêdetir vebestî rabirdûya xwe bin. Sedema sereke ya vê yekê ne ew e ku welatê ji dewletê

bêpar maye, hêjayî zêdetir têkildariyê ye lê belê wekî ku berê jî hat destnîşankirin (û wekî ku pêzanîna sirgûniyê jî pêşniyaz dike), bêcihûwarbûna vî hawî hêviya rojekê vegera li ‘welêt’ tîne bîra meriv. Lewre bi çanda welatê biyanî ve dabestî ji bo jiyînê wekî vebijêrkekê nayê dîtin.

### 3. Agahî li ser Jînenîgariya Romanûsan

Fêrgîn Melîk Aykoç, di sala 1951ê de ji dayik bûye, piştî derbeya leşkerî ya 1980yî demekê ket girtîgehê. Piştî ku ji girtîgehê derket, revî Elmanya ye. Ew jî xwediye çend romanên e. *Siya Dema Borî* yekane romana wî ye ku mekanê wê Ewropa ye. Mustafa Aydoğanê ku bi binemala xwe ji Mêrdînê ye, di sala 1957an de ji dayik bûye û ji sala 1985an û vir ve li Swêdê dijî. Wî gelek nivîskarên navdar yên wek Jack London, Azîz Nesîn, Orhan Pamuk wergerandiye kurdî. Tenê pirtûkeke wî ya bi navê Pêlên Bêrîkirinê heye ku di sala 1997an de weşiyaye. Laleş Qaso ku bi eslê xwe ji Mêrdînê ye di sala 1957an de ji dayik bûye, 10 salan di hepsê de maye. Ji sala 1990 bi vir ve li Swêdê dijî. Bi tenê romana wî ya Ronakbîr li ser serboriyên sirgûniyê radiweste. Medenî Ferho jî di sala 1947an de ji dayik bûye, derdora 1987an revîye Ewropayê û hê jî li Belçîkayê dijî. Heta niha 17 pirtûk weşandiye.

### 4. Analîza Rabêjên Romanî

Cihê cihûwarbûnê nayê wê wateyê ku divê ev cih welatê rastîn ê kesekî be. Ji ber vê yekê, civatên sirgûniyê yên kurd (nebûna dewletê / desthilatdariyê û rewşa bêcihûwarkirina bi darê zorê an jî jidil) seba ku hesta civakê berdewam bikin û têkiliyên bi welêt re bidomînin jiyana xwe li ser pêwendiyên gur yên navneteweyî ava dikin. Ev jî vê pîrsê hazir dike: Mafir wisa ye di nav van romanên sirgûniyê de eger ‘mal/welat’ ne li welatê ku lê dijîn be, nexwe kû ye? Ev pîrseke din der dike – ji welatê ku lê dimînin çi beşer dikin eger ew der ne ‘mal’a wan be?

Ji xeynî rewşa awarte ya kurdan a ku têkildarî ‘niştiman’ê wan ê bêstatû ye, ‘mal’ jixwe têgeheke pir-rehendî (*multi-dimensional*) û pir-tebeqeyî (*multi-layered*) ye. Lêbelê di rewşa koçberî û jihevqetînê de, fikra ‘mal’ê wateyeke têkiltir li xwe bar dike ku ew jî hesta demkîbûnê zindî dike ango ‘mal’a niha wek warê demkî dide fêmkirin. Bi gotineke din, lehengên wê-jeyî yên di romanê de nîşan didin ku cihê lê mayînê wek ‘warê demkî’ tê fêmkirin. Ji vê hêlê de, derbarê avakirina nexweş a ‘welat’ ji derveyî welêt rabêja romanî fikra giştî ya heyberên sirgûnî nîşan dide.

Wekî ku berê jî hat destnîşankirin, her çiqas mekanên piraniya romanan li Kurdistanê be jî, ji wan tenê çend lib di derbarê sirgûniyê de ne. Heta divê lê bê zêdekirin ku yên li ser serboriyên sirgûniyê radiwestin kêmasiya

materyalên têkildarê jîngeha navxweyî û derveyî gotûbêjê dikin, ji hêlekê hêla derve ya çandekê biyanî û kêmbaldariya Ewropîyan ya li gel babetên kurdî rexne dikin, ji hêleke din jî jîngeha navxweyî û kêşe û gazinên ku penaber bi wan re rû bi rû dimînin rexne dikin.

### **Pêlên Bêrîkirinê**

Di *Pêlên Bêrîkirinê* de serlehengê (*protogonist*)ê navnediyar ku rojêke sirgûniyê ya li kolanên Stockholmê şayes dike, bi teknîkeke nav-aşopî (*intra-fictional*) a vebêjê bi kar tîne ku tê de vebêjer ji nişkê ve dikeve nav çîrokê, xwîner dawetî jiyana xwe ya ku ji hêla enstîtuyên kurdî û rêxistinanan ve hatiye rapêçandin dike û koçberên kurd yê din jî wek wî ne. Bi vebêjeke zêde dîdaktîk, ew kurd didin xuyakirin ku ew ne li hewldana afirandina jîngehekê ne ku ji 'welat'ê wan ê dûrmayî cudatir e çimkî ew dikin ku heyîna xwe ya li sirgûniyê wekî maweyeke demkî û kurt bipejirînin. Lê belê di ferqa vê yekê de ne ku ew mawe texmîna wan zêdetir dirêj kir û ji ber vê sedemê hewl didin ku bi hawirdoreke cihê re rûbirû nemînin an jî li sirgûniyê ji xeynî çalakiyên demkî yê sosyo-polîtîk ku seba xatirê 'welat'ê wan e, beşdarî tu xebatê nabin. Serlehengê (*protagonist*) *Pêlên Bêrîkirinê* bi awayekî rasterast têkiliya serleheng ya digel sirgûniyê wiha salix dide "Jiyana sirgûniyê dest û lingên wî girêdabûn" (121), ev jî neçariya piraniya salên li sirgûniyê û negengaziya vegeerê radigire. Lewma ji ber hîsên xurt ên derbarê vegeerê, rewşa sirgûnî ya li devera cihûwarbûnê ji aliyê hesta neaîdiyet û îzolasyonê ve hatiye pênasekirin. *Pêlên Bêrîkirinê* şanî mirov dide ku koçberên kurd him ji hêla vegeerê li welatê xwe bi ser neketine him jî ji hêla ku hewtiya xwe li jiyana nû nayînin ku ji aliyê welatê mazûvan ve li wan hatiye derpêşkirin. Di vê çarçoveyê de, serleheng fikrên xwe yê di heqê serboriya sirgûniyê de wiha raber dike "Dema min dest bi jiyana sirgûniyê kir, min weha hêvî dikir ku lavlavka min a li odeya rûniştinê, du caran li dor odeyê dizivirî, ez ê vegeeriyama welêt. Lê wê dora xwe ya çaran jî temam kir, hîn ez û ew li warekî nenas li çavên hevdu dinihêrin." (166)

### **Siya Dema Borî**

Berevajî *Pêlên Bêrîkirinê* (1997), vebêjerê romana vê axiriyê *Siya Dema Borî* (2009) çima ku cihê bûyerê çîrokê lê qewimiye ango Elmanyaya neşayesandiyê derheqê du romanên kurdî yê ku ji hêla romanûsê kurd ve hatiye nivîsîn, bi awayekî hîcivî rexne dike. Mekanê tê qal kirin, lê di dewsa şayesandina fîzîkî ya Elmanyayê de, li ser hestên bêalî yê derbarê vî welatê de hatiye rawestîn. Bi rastî, ev pêkhatiyên bikitekit balê dikişîne ser hestên xemsa û aciziyê ku ji serê penaberên kurd boriye. Wek ku serleheng tîne

zimên Ewropa bi giştî nayê wateya aştxwaziyê; “Me pal avêt Ewropayê li ber azadiyeke xapînok em reqisîn; tenê ev xaka pîroz dayika birîndar ji bo me bû war û cihê pêşîn” (33-34) ku ji milekî ve, ev rastî tuwanc dike ku Ewropî bicihanîna hevî û pêdiviyên kurdan têk çûne. Û ya dîtir, ji rexne û gazincên wan ên derbarê tevgerên politîk û taybetmendiyên welatê mazûvan li hemberî kurdan, xuya ye ku lehengên (*characters*) di romanên de, bi giranî jî serleheng di wê baweriyê de ne ku şeweya jiyana li sirgûniyê dibe sedem ku penaberên kurd nasnameya xwe ya çandî winda dikin û bîreweriya neteweyî ya wan kêmtir dibe. Wek ku di *Siya Dema Borî* de jî derbas bû, vebêjer welat û Ewropayê wilo dide ber hev “Mêrên li vir [Kurdistan] û li welatên Ewropayê jî nedişibiyên hev (...) Jinan wekî metayekê ji bo frotina hilberînên xwe bikartînin” (59-60). Lê belê, vebêjer wekî Ewropiyan bi tundî kurdan jî napejirîne. Romana ku hişkehişk erîşê dibe ser du heb romanûsên kurd ên li sirgûniyê û xebatên wan, gotûbêj dike ku ji rûyê xwedbîniya hin nivîskarên kurd, gerîlayên kurd wekî fahişeyan hatine resimandin, ev yek jî ne tenê jina kurd bêrûmet dike lê her wiha têkoşîna neteweyî dişikîne. Şayanê gotinê ye ku meriv bibêje ji xeynî faktorên derveyî yê bi welatê mazûvan ve girêdayî, hêmanên navxweyî yê di nav kurdan de dikare wekî sedema têkçûna pêvajoya xwedîbûna maleke nû li sirgûniyê bê hesibandin.

Ji bo kurdên di romanê de, ji hin aliyan ve, adaptasyona li welatê nû û çanda wan rê li ber jibîrkirina nirxên resen û bişaftina dewletên desthilatdar yê ku ew berî sirgûniyê bi salan li hember disekinîn, vedike. Kêmbûna vê pêbaweriyê bêguman dibe sedem ku ew welatê sirgûniyê êdî ne wek ‘warê demkî’ bipejirînin ku fikra wan a vegeerê disitirand. Gengaz e ku romana sêyem ya min behs kiribû ango Ronakbîr de jî heman hizr bê dîtir.

### Ronakbîr

Romana Laleş Qaso Ronakbîr, bi vebêja kesê yekem ve, xwe dispêre serboriyên sirgûniyê yê serlehengê bi navê Ronakbîr ku dibêje ne gengaz e ku penaberekî kurd welatê mazûvan wek welatê dayika xwe bibîne, her çiqas penaber bi salan li wir bijîn jî, hesta windakirin û tenêtiyê her tim dimîne. Vebêjer û lehengê sereke yê ku li Stockholmê dijî Ronakbîr, bi hevsera xwe re li hev nake, wekî ku nikaribe karekî ji bo xwe guncan bibîne, hergav karê xwe diguherîne. Hindek caran, poşmaniya xwe tîne ziman ku welatê xwe ji bo ku were Ewropayê hiştiye, “Çi dîba bila bûba, divabû min welatê xwe terk nekiriba” (48). Ew wekî kesekî lap xerîb, ne dikare li welatê xwe vegere, ne jî dikare bibe perçeyek ji vê civak û çanda nû. Ji bo wî ev tê wateya rêya bişaftinê di nav serdestiya piraniyê de, wekî ku ji pûtepedana

vebêjer ya ku derbarê çanda Swêdê an jî şayesandina fizîkî ya Stockholmê jî diyar e. Ew bi awayekî zelal hesta xurt a xemgîniyê wiha tîne zimên, “Ez qebûl nakimmm (...) Unîversîtan bixwîne; dinyayê, kayînatê û rezaleta insên nas bike; duwanzdeh salan di nav agirê zindanên tirkan de biqijqije; bîst salan li hemberî zilmê têkoşîne bide û di dawiyê de jî were bibe nahtorê pîsiyê, ha! (...) Û bi ser de jî li welatekî Ewropayê! Bêyî xwendinê jî mirov karîbû bûba xwediyê vî gûyî.” (47) Ew xwe bêkêr dibîne, çimkî ew ne dikare ji bo welatê xwe tiştekî bike, ne jî dikare vegere, “Gava ez li vî welatî jî bo milletê xwe nikaribim tiştekî baş bikim û li ber qedemgehan rûnim, ez li vî welatî li çî xwe digirim”(47-48). Hesta windabûn û tenêtiyê ya Ronakbîr ji rûyê têkildariya wî ya niv-dilî ya ku bi penaberên li Stockholmê re danîbû, zêdetir dibe. Ji aliyekî din ve, kêmasiya bîreweriya neteweyî ya kurdan pîsend nake, û hetta ji jina xwe ya ku gerdeniyêke bi resmê Atatürk li xwe dike û muzîka Tirkî guhdarî dike, dût dikeve. Û ya dîtir, atmosfera siyaseta kurdî û ya penaberên kurd li Ewropayê zorê dide wî ku ew divêti û fêdeya doza neteweyî bide ber pîrs û pîrsiyaran ku wî dixê nav gengeşiyê. Ew wiha destnîşan dike: “Doza wan dozeke jî êgir e! Ên ku bi vê dozê radibin, ên ku li hemberî wê disekinin û ên ku bêdeng jî dimînin dişewitin! Ev dozek e ku herkesî dişewitîne”(58). Bi kurtayî, ew ne dikare hîn derûdora xwe ya nû bibe, ne jî dikare nîrxên xwe yê neteweyî yê ku wî pê bawer dikir ku zindî ne, biparêze.

### **Dora Bacîne Bi Dar e**

*Dora Bacîne bi Dar e* ya Medenî Ferho, her çiqas xwe bispêre serboriyên Apê Cemîl yê ku li Elmanya yê wek penaber dijî; vegotina wî li ser kêşeyên têkildarî Kurdistanê radiweste, bi piranî jî balê dikişîne ser gundekî bi navê Bacîne ku şahidiya qetlîameke hovane ya li Êzidiyan kiriye.

Wekî ku berê jî hat destnîşankirin, her çiqas mekanên piraniya roman li Kurdistanê be jî, ji wan tenê çend lib di derbarê sirgûniyê de ne. Hetta divê lê bê zêdekirin ku yê li ser serboriyên sirgûniyê radiwestin kêmasiya materyalên têkildarê jîngeha navxweyî û derveyî gotûbêjê dikin, ji milekî ve hêla derve ya çandêke biyanî û kêmbaldariya ewropîyan ya li gel babetên kurdî rexne dikin, ji milekî din ve jî jîngeha navxweyî û kêşê û gazinên ku penaber rû bi rû dimînin rexne dikin.

*Dora Bacîne Bi Dar e* ya Medenî Ferho jî ne tenê ji rûyê çanda nû ya Ewropayê ye lê her wiha jî rûyê penaberên kurd de wêneyekî neyînî yê Ewropayê xêz dike. Serlehengê romanê Apê Cemîl jî ber ku ji ‘welat’ê xwe bar kiriye, û xemgîn dibe ku wê nikaribe wekî berê derheqê dahatûyê de xeyal bike, dibêje: “Hêvî hatine kuştin. Xewnên me di nav mij û moranê de wînda ne”(19) Ew di wê baweriyê de ye ku jî rûyê sirgûniyê de kurdan hemû tiştên xwe wînda kirine, “Em li welatê

xwe, di nava pez û zeviyên xwe de, di nav rez û ferazeyên xwe de wezîr bûn. Rast e telefonên me nebûn, rast e elektrîka me nebû, rast e trimbêlên me nebûn, lê car din em wezîrê mala xwe bûn. Zimanekî me hebû, bangeke me hebû, awazeke me hebû...Niha em rîtalê nava sikak û kolanên bajarê Elmanya ne. Ne zar heye, ne zarav... Ne banga me heye, ne awaza me...ez hewqas temenî din bikim ez nikarim fêrî azan û banga wan bibim”(37)

Ya dîtir xisara ku ji sirgûniyê çêdibe li hêlekê, Apê Cemîl di heman demê de rexneyê li kurdên li Elmanyayê dijîn dike ku çanda xwe û nirxên xwe piştguh kirine. Li gorî vegotinên Apê Cemîl, yek dikare îdia bike ku koçberiya ji ‘welêt’ dijminê nirxên girêdayî ‘*bav û kalan*’ e. Di seranserê romanê de, Apê Cemîl ê ku bi salan li Elmanyayê wek penaber maye, rewşa penaberên di yên kurd salix dide û balê dikişîne ser xetereya sirgûniyê ku qutkirina peywendiyên kesekî ji welatê wî/wê ye. Apê Cemîl fikrên xwe yên derheqê dûrbûna ji ‘welat’ amaje dike. Her çi dike, xwe tenê dibîne û hînî mercên jiyânê û çanda welatê mazûvan nabe wekî ku dibêje “Em reviyên bi hawarê!... Me nizanibû ku xerîbî jî bi neyar e!...”(46). Di nava koçberan de, ev hestên neyînî yên xurt derheqê sirgûniyê, hestên bêmalbûn, xerîbdîtî û nepejirandina Elmanyayê wek ‘mal’a nû, xurt dike. Her wiha Cemîl di wê qenaetê de ye ku xeyalên wan bi cihê ku ew lê koçber in li hev nakin: [...] Cîhana me û ya wan nabe weke hev. Xewn û xeyalên me, hêvî û niyazên me nabin yek (93). Dema ku mercên jiyânê bigire heta rewşa hewayê, her tiştê welatê xwe û cihê xwe yê nû dide ber hev (115), koçberên kurd wisa xuya dike ku nikarin hînî wî fikrî bibin an jî wî fikrî hildin ku aîdê welatê mazûvan in: rastî ev e ku ew welat ne welatê wan e. Vebêjer bi eşkereyî kêmasiya adaptasyona kurdên koçber derdixe holê: “Jiyaneke di nava kuştina hêvî û daxwazan de ji xaka Kurdistanê re rê girtiye hatiye xaka Ewropa yê. Ev mirovên ku axa xwe berdane, xanûmanê xwe terikandine, pez û dewarên xwe hiştine, evîna xwe sêwî li ber lat û kuçan, di nava sikak û zaboqên gund û bajarên wêran de hiştine (...) Li vî welatê biyanî ku ne zimanê wî dizanin, ne toreyên wî dizanin, ne evîna wî fam dikin” (134-135).

Dîsa bi heman karî, siyasetmedara kurd Felekna Uca ya ku li Elmanyayê ye, di vê romanê de wek lehengeke biçûk xuya dike û şîretên wiha li koçberên kurd yên li Almanyayê dike: “Ji xewnên berê şiyar bibin... Ne roja vir roja welat e ne şeva vir... Ne hewa vir ya welat e ne jiyana vir...Hûn êdî li jiyaneke cuda ne... Cîhan jî ne li gorî hiş û ramanên we, ne li gorî daxwazên we, ne li gorî hêviyên we dizivire...” (115).

Ji bo kurdên di romanê de, ji hin aliyan adaptasyona li welatê nû û çanda wan rê li ber jibîrkirina nirxên resen û bişaftina dewletên desthilatdar yên ku ew berî sirgûniyê bi salan li hember disekinîn, vedike. Kêmbûna vê

pêbaweriyê bêguman dibe sedem ku ew welatê sirgûniyê êdî ne weke ‘warê demkî’ bipejirînin ku fikra wan a vegeêrê disitirand.

## 5. Ramanên Dawiyê

Ji xeynî romanên ku li jor hatine listekirin, romanên sirgûnî yên mayîn hîç behsa sirgûna kurdan nakin, hetta hinek ji van romanûsan li wir jiyane û 20 salan zêdetir e hê jî li wir dijîn. Tema û babetên van romanên bi gelemperî destan, efsane, dîrok û polîtîkayên rojane yên Kurdistanê di nêv xwe de dihewîne. Bi gotineke din, xala ku balê dikişîne, welatê wan bi xwe ye, welatê mazûvan nîne; lewma li Kurdistanê rewşa sosyo-polîtîk û hestên ne kêfxweş bo welatê mazûvan dibe sedem ku di hilbera romanê de tenê li ser welatê xwe yê heqîqî konsantre bibin, û tev li derûdora xwe ya nû nebin.

Ji dêvla ku piraniya romanên xwe bispêrin serboriya sirgûniyê, xwe dispêrin babetên têkildarî Kurdistanê, ev yek raberî me dike ku sirgûna kurdan bêguman bi awayekî tund di bin karîgeriya Kurdistanê de maye. Lewma di rewşa civata sirgûniyê ya kurdan û ji ber bê-desthilatdariyê gotegotên der heqê welêt de, neteweyê bihêz dike û wekî xala balkêş kurdan dicivîne ser hev. Lê belê ev dikare wekî sedema sereke ya têkçûna entegrasyona nasnameyê li welatê mazûvan bê dîtin.

Romana kurdî di heman demê de xwezaya polîtîkî û wateya ‘welat’ problematîze dike, û pêvajoyeke dînamîk û tevlihev pêşniyaz dike. Xeyala ‘welat’ a lehengan xwe dispêre rabirdûya xemgîn, ev dema niha ya kavlîbûyî û dahatûya bêhêvî. Têgihîştina rabirdûyê, dema niha û dahatûya wan, di nav vîzyona cihêreng ya Kurdistanê de têgehkirina ‘mal’ê, ji ber vê yekê bêmalîyeke dualî diafirîne. Anegorî Rosemary Marangoly George (1996: 175) lehengên wêjeyî yên koçber, him jin û him jî mêr, di nebûna ‘mal’ê de, di navbeyna “hisreta mala rasteqîn” û “naskirina ne-rasteqîn an jî afirandina hesta hemû malan” de dudilî dimînin. Angaşt Marangoly George ya ku li ser guherîna şayesandina ‘mal’ a di edebiyata îngilîzî ya sedsala bîstemîn hûr dibe bi xurtî têkildarî wateyên ‘mal’ê ye ku dikare ji rabêja romanî ya kurdî wekî têgihîştineke alternatîf û zêf a ‘malan’ tê hilberandin di romanên de pîvanekê pêşniyaz dike ku tu îxtimala ku ew derdora xwe ya nû di dahatûyeke nêz de wekî mala xwe ya nû bifikirin, tune. Bi gotineke dî, zehmet e ku mirov qala pêvajoya domdar ya ‘mal-bûn’ê ku li welatê nû ava dibe, bike.

Her çiqas kurd ji desthilatdariyê pêpar mabin jî, dîlemaya serboriyên penaberên li sirgûniyê ya David Turton ji bo mînak kurdên di rabêja romanî ya kurdî de derbasdar e ji ber ku hemû romanûs penaberên sîyasî ne. Turton dibêje ku (2002:25) penaber li warê nakokiyên radiwestin ku



di navbeyna aîdbûn û ne aîdbûnê de ye, çimkî maweyek heye ku tê de ne dikarin xwe ji welatê xwe yê heqîqî biparêzin, ne jî dikarin xwe ji welatê xwe yê penaberiyê biparêzin. Bi rengê angaştê Turton, welatê kurda yê ne-aram wek cihêkî ne-ewle û bêîstiqrar tê şayesandin û bi ser de jî cihê ku halîhazir lê ne wek cihêkî ne aram û ne ewle tê dîtin. Lewma, ew li warekî demkî bi cih dibin.

Sîyaseta welêt di heman demê de bûye babet û balkêşiyek bo romanên kurdî yên sirgûniyê, lê ne bi awayê ku ji aliyê Rushdie (1991) ve hatiye pêş-niyaz kirin ku konseptê ‘melezbûn’ê “navdar û xwedî deman e wek cureya aqilê çandêke payebilind ji ber avantajê di navber-bûnê de (in-betweenness), di navbera du çandan de dimîne, hewldana dawî ya mizakerekirina cudahiye ye” (Hoogvelt, 1997: 158). Lê belê vebêj berpêş dikin ku lehengên kurd nikarin çanda cihêreng a jî derûdora xwe ya nû sûtê werbigrin û dîsa nikarin rengêkî xwemalî li van hêmanan bar bikin. Berevajî vê yekê, ev peywendê nû her dem tê rexnekirin. Welatê nû li kêlekekê, gotûbêjkirina wêjeyî li ser welatê xwemalî, her çiqas di nêv xwe de fikra vegeerê bihewîne jî nikare ji heqê kêmasiyên takekesî û civakî yên lehengan derkeve. Di vî halî de, fikra vegeerê li ser teşeyê negengaz an jî çalakiya ne-pênasekirî rûdinê.

Kurdên di vebêja aşopî de, ne dikarin xwe li welatê mazûvan wek li ‘mal’ê hîs bikin, ne jî dikarin li welatê xwe vegeerin. Hetta dema vedigerin, jî ber rewşên li welêt hesta bêaîdîyetê winda nabe. Kêmasiya adaptasyonê ya bi welatê nû re ne tenê têkildarî çandêke nû ye (ev bandorê li wan nake), lê di heman demê de ji ber kêmasiya yekîtiya di navbera civaka li sirgûniyê ye (ev yek di heman demê de di avakirina hesta ‘di navber-bûnê de’ jî girîng e.) Him di nav sînorên civaka xwe de him jî li derveyî vî sînorî, di avakirina têkiliyeke xurt de têk diçin. Di vî halî de, ji aliyê endamên sirgûniyê yê bêcihûwarbûyî, niqas û perçebûyîn, serborî û xeyala rabirdûyê û rêya rûbirûbûna rastiyên tûj yên sirgûniyê dibe bersiveke xurt.

---

#### ÇAVKANÎ:

1. Hoogvelt, Ankie: *Globalization an the Post- Colonial World, The New Ecougwy of Development*, Mac Millian Press, 1997
2. Marangoly Georg, Rosemary: *The Politics of Home: Postcolonial Relocations and The Twentieth Century Fiction*, Cambridge Universty Press, 1996
3. Hall, Stuart: “The Question of Cultural Identity”. In: Hall, David Held, Anthony McGrew (eds), *Modernity and Its Futures*. Cambridge: Polity Press, 1992